Sînor

PROJEYÊ CAMIYEKÊ

Luqman Asîhî

Dema min dîtî ku di nava wî projeyê xwe yê pir mezin de camiyeka rind û xweşik duris tkiriye, min di dilê xwe de got: ev heqê wî ye. Xwedê waha zengîn kir, gerek e hinek ji deravê wî, ji xêr û xêratan û avakirina camî û mizgeftên Xwedê re be. Ma çi hebû? Ta beriya du rojan jî xuha eniya xwe ve dixwar. Kerem tenê ya Xwedê ye. Bi şev dema min ev yek ji apê xwe yê Simoyî re got, hinekê hizrî û paşî bi min kenî û got: Dibêjin yê Heco nas dikir, dizanî Heco çi axe û yê nas nedikir û berê xwe dida ser û sîmayên wî, digot: av di destên Hecoyî de dimeyit. Wê salê Îsayê aşvan pezekê baş li xwe kom kiribû. Aşvaniya xwe dikir û pezê xwe jî pê re xwedî dikir. Roja ku çavê Hecoyî bi pezê wî ket, xwazt bi her rêka hebe, bo xwe bibe û xwe lê bike xwedî. Cara yekê Hecoyî kurê xwe Cembelî şande cem Îsayî. Cembelî bi zimanekê şêrîn ji Îsayî re got: ez mirovekê rêncber im, ez hatime şivaniya pezê te bikim, tu aşê xwe bigêre. Îsayê aşvan bi gotinên wî qayîl nebû û ew jî vegera cem babê xwe yê Heco dest ji lingan dirêjtir. Roja din Hecoyî bi xwe koka xwe kir û destekê tizbiyan xiste di nava tiliyên xwe de û zengilek bi serê sola xwe ve girêda û telîsekê genim li pişta kerê xwe yê boz kir û ber bi aşê Îsayî rê hajot, dema cavê aşvanî bi serûberê wî ketî û dengê zengilên wî çûye guhên wî, hêbetgirtî bû û pirsî: çima te ev zengil bi lingên xwe ve kirine?

Hecoyî got: ez pir ji Xwedê ditirsim. Gava ez bi rêkekê diçim, dengê ji van zengilan tê û mêrikên biçûk xwe ji rêkê didin aliyekê û nahên kujtin! Dema Îsayî ev yek bihîstî, di dilê xwe de, got: ev baştirîn mirov e pezî bi xwe re bibe zozanan. Lê dema ya dilê xwe ji Heco re got, wî gotê: ez ditirsim, emanet barekê pir giran e û tu min di tehlukê nebe. Axir, li dawiyê Heco razîbû û pez bi xwe re bir.

Roj û meh çûn û befrê erd sipî kir û urban ji zozana vegeran, Îsayê aşvan jî telîsekê ar li pişta kerê xwe kir û ji dostê xwe yê Heco re bir. Dema geha wê derê, hê li devê derî Heco nehişt xweyê pezî bi jor bikeve . Dema pirsyara pezê xwe jê ker ka di çi rewşê de ye, Heco bi serbanî ket û gazî kir: haware xelkino... Haware gundîno! Ev kî şivan hatiye xwe li pezê min dike xwedan… Gundî li Heco û Îsayî kombûn û teva hind li şivanê reben êxistin ta ku li hemdê Hecoyî hat.